
helbest

SEBRÎ BOTANÎ



# Şîn û şadî

NEFEL

www.nefel.com
info@nefel.com

# Şîn û şadî

# Şîn û şadî

SEBRÎ BOTANÎ

NEFEL
Stockholm
2002

www.nefel.com
info@nefel.com

**Sebrî Botanî:** Şîn û şadî

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Sebrî Botanî û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002
ISBN: 91-89687-01-9

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike û di Internetê de bêxe malpera xwe.

# Nêverok

Pêşgotina Beşîr Botanî ........ 7

Pêşgotina Sebrî Botanî ........ 9

Dilo jaro ........ 15
Evîna pîroz ........ 16
Li ber dengê dehola kurd ........ 17
Gulbihar û mêşa hingivînê ........ 19
Gulbihar û bilbil ........ 22
Dibin gorî te gulnazê ........ 24
Strana gulbiharê ........ 25
Her erê me ........ 26
Mêr û qelsemêr ........ 28
Me got belkî ........ 29
Her evîndarê caran im ........ 30
Ez û dapîroşk ........ 31
Gazindek ji dilberê ........ 33
Felek dest e ........ 34
Newroz cejna kurda ye ........ 35
Cotyar û zevî ........ 37
Viyana miletê min ........ 38
Yara nazenîn ........ 39
Qelenê giran ........ 40
Bihara welatê min ........ 41
Çavenêr im ........ 42
Şivan ........ 43
Bextê vajî ........ 45
Keçê gulê ka mizgînî ........ 47
Rabe ser xwe ezgorî ........ 49

Zêrê bêxêr ..... 51
Van kesan binasin ..... 52
Min bi çavê min bibîne ..... 53
Bo dîndarê xwînmij ..... 55
Kovara Birayî ..... 56
Ez gul im, tu gulçin î ..... 57
Gulbihar û kotir ..... 58
Ger ne wilo bim ..... 61
Peyman ..... 62
Ey keça kurd ..... 63
Gulbihar û pelîtank ..... 64
Gula evîna min ..... 65
Pîra şîretvan ..... 66
Gulbihar û xalxalok ..... 71
Xiyala bê tirs û rev ..... 74
Ey keça baş Gulbehar ..... 78
Were were ..... 79
Gulbehar û kew ..... 80
Ez û dilber ..... 82
Deng û hunerê Gulbeharê ..... 84
Bilbil jivanê gulê ye ..... 87
Ji evînê narevîn ..... 90
Bawer bike ..... 92
Ez dizanim tu çend î ..... 93
Dil ji min bir ..... 95
Ya Reb te bo kê hêlaye ..... 96
Zimanê kurdî ..... 97


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Pêşgotina Beşîr Botanî

Xwendewarên rêzdar, dema kek Serbest Zaxoyî ev dîwan bi pîtên kurdî yên latînî çap kir, hingê ew nivîsîna kurdiya latînî baş fêr nebû, ji lewre çewtiyên nivîsînê gelek bûn. Û li pey dîtina babê min, ko nêzîk 300 çewtiyên çapê hebûn! Êdî ez piştrast im, ko çewtî di vê çapa çarê de nemane; babê min dixwend û min dinivîsî û bi alîkarî û hevkariya me herduyan hêvîdar im ko çapa vê carê ji yên dî rêkûpêktir be.

Wek têt zanîn, ko babê min 1944-ê ji êla xwe »jêliyan« û hem jî ji malbata xwe »Temer« (Kurdistana Tirkiye û Sûriyeyê) dûr ket û xwe gehand Kurdistana Îraqê; bû endamê Partiya Hîwayê, pişt re bû endamê PDK-ê. Hingê ew xortekî pir xûngerm bû, ji lewre helbest dinivîsîn, nemaze yên sanahî »wek helbestên stranan«, ew jî li ser rewşa wê demê dima. Îcar ez dixwazim rewşa wê demê baş deynim ber çavên hemî hêzên siyasî, yên ko ta niho pûte bi rewşenbîrên xwe nadin. Êdî hûn û bîranînek ji bîranînên babê min ko behsa »piştemêrê romê« dike. Ewî sala 1947-ê wesan nivîsî:

Nayifê Gundşêxî kevnecendirme bû, sala 1947-ê ji Sêrtê hat mala xwezûrê xwe li Mûsilê. Hevbîna me, mala xwezûrê wî û hemû xizm û nasyaran karê her şev bû. Eger em neçûna nik wan, tekez ew dihatin nik me. Me bê qam û bê sinûr pir pir ji hev hez dikir. Hingê her cihê ez diçûmê an çûbamê, bê xwendina helbestan venedigeram, lê ew helbest hemû jî xwehr, bêser û ber û nîvşkestî bûn, lê pa ji peyv û daxwazên pîroz dagirtî bûn.

Êvarekê, em li mala wan bûn, mêr û jinan li hundurê xênî ça û qehwe vedixwarin, serhatiyên xwe ji hev re vediguhastin, piçûkên 10 ta 12-salî li hewşê dileyistin, paşê min jî xwe kir hevalê wan û bi wan re leyist. Hêdî hêdî, min rahêla xwendina helbestan; min dixwend û zaroyan jî guhên xwe loç dikirin (vedikirin) û haya me ji bayê felekê nebû. Ji nişkê ve Nayîfê Gundşêxî li min heyitand û got:

— Hey gayê nêv golikan, ew tu çi dibêjî? Pa bi serê Şêx Şehwelî, Cimhûriyet pê bizane, dê te bê guh û gun bikin, paşê jî serserkî te hi-

lawêsin û kesên guhdariya te jî kirine, dê di zîndana Sêrtê de birizînin. Hema zû ji ber çavên min here, dûrkeve!

Wî bi vê gotinê ez pir şkandim û min ji wan zaroyên hûr jî pir şerm kir. Ka çend ez hatim xwe, min bersivek baş peyda nekir! Piştî bîstekê min bi dengekî bilind bersiva wî da:

— Tu li binê dinyayê jî piştemêrê roma teres î! Heke tu ji wan bitirsî, tu bi kêfa xwe yî, lê tu çire zaroyên kurdan çavtirsandî dikî?! Gelo tu çima qelsemêr î, hem jî tirsonek û xiniz î?!

Dema min welê got, Nayifî serê xwe hejand û bi dengekî nizm got:

— Sebro, haya min ji te heye! Te jî zimanê xwe wek barzaniyan dirêj kir û dê pê mala me hemiyan kavil bikî.

Di dûmahiyê de, ez bi babê xwe pir serbilind im, ko ew di cengên birakujiyê de beşdar nebû, lê belê yekîtiya wan dixwest. Ji lewre hêvîdar im, ko ew ji rastî û helwêsta wî neenirin û hêrs jî nebin.

Stockholm, sala 1996-ê

**Beşîr Botanî**

## Pêşgotina Sebrî Botanî

Ji sala 1944-ê ve ez û şi'ir bi hev re dijîn, lê li sala 1946-ê ve di zîndana Mûsilê de jîna min di gel vehandinê destpê dikit. Dost û hevalên min bi xwendina şi'iran keyfxweş dibûn. Car hebû her ji nivîsîn û helgirtina wan dilgiran dibûn. Car hebû her kaxezek di destê min de dîtiban, direvandin û bi lez didirandin. Lê mirov bo Xwedê bêje, ev hozan bûbûn qajik û benîştê devên wan, nemaze ji ber sivikayî û nermiya wan, bi sanahî dihatin jiberkirin û li nav xelkê belav dibûn, nemaze ew hozanên ko pesnê welatî dikirin, yan jî siyasî bûna. Ca ji tirsan, ne ji xemsarî û bêsexbîrî nehatin nivîsandin û helgirtin, her ji lew re jî hejmara wan ta sala 1957-ê 25 ta 30 parçe şi'irên kurt bû, pitir nebû.

Silo: – Wey babo. Tu dibînî vî çepelê pîs çawan dîsan zimanê xwe dirêj kir û gotinek ji serê xwe mezintir kir? Pa serê Şêxê Basret evê xwe li kelemekî bidit, lê hêj maye. Gelî civatê, ha iha. Her ji nuha bizanin heke Sebro em jî bi xwe re li belayekî nedan, ez tiştekî ji vê dinyayê nizanim. Ka cê were jî Kurto. Te çi niyet e? Ev çi gotin û motinên çirok û bê serûber tu dikî? Bêje! Heke na, ez dê wê bi serê te bînim, ko kesê nebihîstiye. Erê Sofî Simo, Zelîxa, Mela Elî, Xalid hûn na bêjne min vî çi divêt? Kuro Sebro, hê hê êdî piştî îro ez te nebînim ha. Heke na, ez dê lingê te bişkênim. Wey babooooo, tu dibêjî qey wî kafirê Cegerxwînî tif kiriye devê wî. Wê roja henê li ser berbanka mala Xelîlê Xelo zirzira wî dihat û qêr kiribû »Pîra Torê û Ey felek« û birazîka min Nêrgiza Hevindê Sîto di gel wî Sêwelekê kurê Osmanê Temoyî, ko navê wî li ser zimanê min e, lê li bîra min nemaye, vêkre lê vedigerandin.

Xalid: – Jê gere mamê Silo, hey Xwedê ji te razî, ma nê ji banger girantir bi ser belengaza mêroyê de na yê. Ma ji vê bêtir û wêvetir çi heye? Ma heta kengê? Ne ew hezar bi navê wî. Heke ne wek bi gotina wî ba, wî jî ev pirtepirt ne dikir, de bila ew jî kela dilê hezar wek min verêjit, ma ne we ye gelî civatê, hûn çi dibêjin?

Silo: – Diyar e tiştekî di ber barê te rajî. Ha, hey ho birazî hey ho, tu yekî dizanî, ez hezaran. Lê pê ne axivin ha. bila kes nezanit, ne me dîtiye û ne bînandiye.

Zelîxa:– Weyla kezîkurê ezê, ce »wella webilla wetilla«, bi wê Qurana di mala mela Evdil-Rehmanê Hoserî de, vî Sebrokî wê rojê hindav kanîka jinan hindek tişt digotin, li canê min pir xweş dihatin, paşê dîtra rojê min ha ji xwe nebû, min hew dît ji nişkan ve ez di ber hevîrî re dibêjim. Dîsan berî şeş heft rojan min dît Xezala Şahokê rezvan, Binefşa Siyamend û Mecîdê Remoyî vêk re strana »Pîra hinavsotî« qêr kiribûn, lê pa stranê tu stran î, ji Xwedê bawer kin ne ji min agir pê berdidan dilê min, çi nemabû ez bigrîm, paşê her dîsan bi hev re lavja »Adarokê« qêr kirin, anko Newroza me kurdan, êdî min xwe ranegirt û ji keyfa min teşîka xwe girt û li erdê xist û xwe di nav komka wan wer kir û bi wan re xwe hilavêt, pa xwezî, sed xwezî we jî wek min zanîba çend xweş û xemrevîn bûn.

Mela Elî: – Pa wê Qurana ez lê dixwînim, carekê li ber taqê mizgeftê çîrokek ji zarokan re digot, hemiyan xwe mit û bêdeng kiribûn, te digot sofî ne li civata şêxî ne, ez di jûr ve bûm guhê min ma li ser pencerokê heta çîroka xwe hew kir.

Silo:– De bêje ka çi got?! Wî şekirî jî ji me re bişkêne.

Mela Elî:– Ew digot ya ko kesî ne dîtiye û ne bihîstiye, bawer ke ez gihame vî emrî hêşta min ev ne zaniye, ez nizanim wek wî bêjim, lê pa hindek li bîra min maye. Digot »Hebû nebû, kes ji Xwedê mezintir nebû. Ne çiya ji çiyayên me xweştir hene û ne ziman ji zimanê me şirîntir hene. Zarokekî şeş-heftsalî ji kalekî sedsalî pirs kir û got:

— Erê bapîro, tu nabêjî min azadî çi ye û aştî anko çi?

Kalê dinyadîtî çavên xwe nuqandin û hizrek bir û yek anî, paşê serê xwe hejand û bi dilekî pir kovan bersiva wî da û got:

— Quzilqurt û kerafî bit, heke min azadî tam û bêhn kiribit. Jehra serê koremar bit heke min aştî dîtibit. Lê heke te divêt tu tiştekî ji van tiştan bizanî, ez dişêm li gor zanîna xwe ji te re bêjim.

Kurkê me xwe bêdeng kir û guhê wî ma li ser dengê kalo û çavê wî ma li devê wî ka dê çi bêjit. Kalê me dîsan çav nuqandin û devê xwe vekir û zimanê xwe berda û got:

— Şirîn e, şirîn e, şirîn e, pir ji wan şekrokên sor, spî, kesk, zer û xemrî şirîntir û xweştir e. Dûkêla agirê reya wê çavên tarî ron dikit. Bêhna wê pîremêrên wek min ciwan dikit. Bayê evîna wê dijwar e, hawar li min pîr û lawan dihejînit. Malwêranî di rêka wê de ji kayê erzantir e, kurt kurmancî dûmahîka wê xêr û bêr û xweşî ye û tenahî û serfirazî li her derê belav dibin û êdî kes bindestiya kesî na kit.

Pîro ev got û rawesta. Kurkê me pirsek dî kir û got:


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Baş e bapîro, pa rengê wê çawa ye?

Tîqtîqa kenê pîroyî giha çerxa felekê, kelegirî di hefkê de asê ma û çend dilopek ji rondikên şîn û şadî ji çavên wî ên melûl bi ser hinarokên ruyê wî ê çermîn û lawaz de hatin xwar û daketin ser rihdîna spî û pêve nûsan, te digot xunav e li ser xûsarê. Kurkê biçûk şaş ma êdî ne zanî çi bikit û çi bêjit. Pîremêrê zimanşîrîn bê ko çav û ruyê xwe ji rondikan paqij bikit, xwe kenand û got:

— Rengê wê ji rengê kulîlkên gundê te ne; kesk e, sor e, spî ye, zer e û roja geş raser e. Aştî jî anko tenahî û kes şerê kesî nakit û Fatê dilê Eyşê naşkênit û ferq û cudayî di navbera min û mam Elî da namînit. Demokratî jî heye, lê çîroka wê dirêj e, ez hê 40-salî bûm, ko min ev navê pîroz bihîstî û heta vê gavê hêj dibhîzim, lê bawer bike bapîr bigorî ez tiştekî jê nizanim. Lê mirovên xwendevan çêtir dizanin ka çi heye û çi nîne û ka rewşa demokratiyê jî çi ye û çawa ye. Anko dê demokratiya rast û paqij, ji ya xwehr û vajî nas bikin. Bixwîne da tu serbest bijî, mirovê xwendî dê bi kêr xwe û miletê xwe bit, lê kesê nexwenda û tiral dê bibit bela serê xwe û xelkê û dê bi sanahî jî bêt xapandin, çinkî rast û ziran jêk na veqetînit. Zirîtî mala nezanan kavil dikit.

Kurkî gotê:

— Erê zirîtî vêca çi ye, bapîro?

Pîro: – Çîroka wê jî dirêj e, ezê ji te re kurt kim. Herweko çawa zirpîvaz, zirgûz, zirdînar hene, zirmela û zirefendî jî hene, zirheval û zirşa‘ir û gelek dî ji bil van jî hene. Heke em van ziran baş nas nekin û bi xelkê jî nedin zanîn û nas kirin, ma dê çawa ziran ji rastan binasin û xwe ji wan biparêzin? Ma eger Gorgîsê Xemo û Lezgînê Xeca sermezin zirnas bûna, kengê Orxan Efendî û mam Elî dişiyan wê zevîka zêrîn ji destê wan derînin û tirto virto bikin?

Axînek dirêj ji kûratiya dilê kurkî derhat:

— Aaaax, min nezanî. Ji nû min zanî, ka ji bo çi Şahokê Canko û pismamê min Xeloyî xwe kirin gorî wan navên pîroz û ka bo çi navê min Azad e. Pa soz bit, ez ji bo azadî, demokratî, aştî û rastiyê bijîm û rast û zira jêk binasim û »zîqûzirê« bi ziran bikim.

Li sala 1957-ê li Zaxoyê dikandar bûm, ji nû:

Lezke b’lezîne ey qelem
Gelek borîne sal û dem

Tev jîna tehl û derd û xem
Li dil dijenin sed kelem

Derke ji dil jana sitem
Da vejînim gurzê Rostem

Paşê bere bere min dest bi nivîsîna wan 25–30 parça kir, ko di navbera 1946-ê û 1957-ê de hatin gotin, lê nehatin nivîsîn. Lê ji sê parça zêdetir li bîra min nemabûn. Ca neçar bûm ji devên biraderan wergirim. Binvîse hey binvîse; wan çi got min nivîsî, rast nerast, çare nebû û min bawer kir. Bi vî awayî tibabek nedîtî, eger ez bêjim çarêka wan, tu bêje pitir, çi pêwendî bi min ve nemabûn. Eger ez bêjim peyvek ji filan malkê, tu bêje nîvê wê. Ji bil vê gêjahiyê hin malkên biyanî jî di nav de sîs dikirin û hindek jî paş û pêş bûbûn. Hindek bêtam bûbûn û hindek xweştir û naziktir. Ez çend hatimê min tiştek ji tiştekî dernekir û wek berê lê nehatve. Neçar bûm ko hana xwe bigehînim rehmetî mela Enwerê Mayî, xwend û got:

— Xwe pê ve bes biwestîne, xwezî her wek xwe maban.

Paşê qelem girt û ev rist li ser rûpelê 184-ê nivîsî:

— Paşerojeka geş li pêş xudanê van şi'iran diyar e.

Min bi şîreta seydayê hêja û nemir kir û min şiya wê destnivîsa tîplatînî, ko ew hemî hozanên ji sala 1946-ê ta 1973-ê tê de bûn, wek bîbûka çavê xwe biparêzim. Lê paşê ne mixabin ji kîs çû di gel wê west û zehmet û pûtepêkirinê. Bêguman ez di xema wê de neketim; gula evîna min çirmisî, kelha evîna min tepisî, vêca ew çi ye? Hiş û bîr vê dibêjin, lê heçîke dilê jar û evîndar e, ji doza xwe qet nayê xwarê û li pey vê pîvanê naçit. Baş e, pa eger destnivîsa (Şîn û şadî) nemabit, pa gelo hozanên vê dîwanokê ji kû hatin? Ji bil çend parçeyekê ko li sala 1975-ê min nivîsîn, ên dî hemî bi saya serên şagird û suxtên kurdan li derveyê welatî ko di navbera sala 1962-ê û 1973-ê carcar parçeyek kêmtir bêtir, ji destnivîsê veduguhastin û di gel xwe dibirin, bi vî karê wan tibabek jê hat parastin û ji bahoza reş verest. Lê piştî ko min zehmetek mezin pêve dît, heta vê dûmahiyê jî her dişandin, bêguman bêtir û çêtirê wan hêj mane. Hindek ne berdest in, hindek jî bi kêr niha nahên, lê eger hat, hingê komkirin û çapkirin sanahî ye. Ca heta hingê ev tibab pêşkêş e, ko bêguman hindek jê ne bi dilê min in, nemaze ew ên evîndariya lawîniyê, ko berî 20 salan hatin danan. Lê hema çawa bin, baş in û hîvîdar im nekevime ber gilî û


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

gazindan. Bila xwendevan bizanin, ko her ev ji min hat û bes. carna min ji xwe dipirsî:

— Gelo ev hozanok dihêjin, ko mirovek wek min şepirze û ser- û dilşkestî, destkurt û hinavsotî, xwe pêve biwestînit û diravê xwe lê bimezêxit?

Bersiv li nik xwendevanan e, ca eger erê, eger na. Lê ez dibêjim heke mirov birsî dibit, nemaze kesê destkurt û belengaz pariyek nanê req û tisî jî bi dest bikevit, jê naborit û her di cih de dixwut. Hema wan jî bi wê hizrê bibînin. Lê her kesê keyf pê ne yê û hest û hizrên wî pê ne bizivin, bila ji qenciya xwe bidirînit û bavêjit çol û çiya û li ber befr û baranê biheşifin û bin ax bibin; wê axa ko bêhna sîng û ber û bedenê dayka min û Gulbiharê jê tê û bibin kîmya bo gul û giya, gul û giyayê welatê me yê şîrîn û ew hemî ken, girî û gilî û gazind tev li rehên daran bibin.

Bo çi ev dîwan ji pesn û navê Gulbiharê pir e? Min Gulbihar bi çav nedîtiye, lê ji mêj e, ko ji dûr ve min nas kir, nasînek baş. Nivîsarên min ne ko hema ji pesnê wê dagirtî ne û bes, belko min hozan jî, ji zarê wê vehînane û hem li ser wê û hunerê wê jî nivîsîne. Her parça tu dixwînî bêhna gulê jê tê, gula hunermend pencera min e, ez geşatî û spehîtiya hemî dol û nizar û çiyayên Kurdistana rengîn têre dibînim. Bîstaneke xemildar û xemlandî ye, hemî reng û tuxm û texlîtê gul û gulçîçekên welatê kurdan têde dibînim û bêhn dikim. Gulê gula hunerî ye, lê gelek mixabin, ko ji bêkesî her wek xwe ma. Çinkî li gor vê hêjabûna ko ez têde dibînim, ne hat perwerdekirin. Tibabek babetên berketî ji folklora kurdî bi rezalet min peyda kiribû û tibabek jî min nivîsîbû û ez li hîviya hatina delîvekê bûm, ko wan babetan hêdî hêdî wek bexçevanekî şareza di bexçê hunerê Gulbiharê de biçînim, lê çi bikim? Ne ew delîva zêrîn hat û ne ew babet man û bexçê hunerê gula me her wek xwe ma û ma. Paşê bextê vajî delîvek reş û nepîroz îna û ez gehandimê. Gula evîna min û Gulbiharê ew rewş, xeml û pergala berê ne mabû, min girt û li ser derd û xeman vezeland. Dilberê bi dengê melûl, bi wan çavên reşbelek, berê xwe da min û got:

Ey tiralê delîvkuj, kê ev destê biyanî
li ser sîngê min danî

Siktir, ji min dûr keve
bimre an jî serkeve

Ev derd ji destê te bû
Ev text ne textê me bû

Bêje min kanê ew text?
Çendî sal e min dixwest!

Ta neînî wî bextî
Ta nerakî vî destî

Nabim bûka serbestî
Nabim bûka serbestî

Min got:
— Gulê guh nedê, dûvê dinyayê dirêj e. Lê lê çû, lo lo maye ey stêra geşa asmanê şîn û şadiya evîndarê serneçemandî.

Bexdad, 1-ê gulana 1978-ê

**Sebrî Botanî**

## Dilo jaro

Bibim gorî cihê ew lê
Ne carek lê hezar carî
Tilsima ser devê min e
Ronah'ya jîna tarî

Rêl û kaş e evîna wê
Bi neynûka' ez dikêlim
Ji mêj ve min vekolaye
Heta dimrim wê nahêlim

Jana evîna te gulê
Çenda bêjim nayê gotin
Dinalînim şev û rojê
Dil û hinav li min sotin

Şîn û şadî dikin cengê
Perîşan im di beynê da
Dilo, jaro, evîndaro
Gul mêvan e di xewnê da

Ken û girî nehêlane
Şev û roj û dem û sal e
Di gel me ye salê carek
Tu Xudê dilo ev hal e

## Evîna pîroz

Memê reben evîndar bû
Beko rabû jehir tê kir
Bi kîna reş vekola bû
Di zîndana Cizîrê kir

Wî neďzanî bi vî karî
Pîroziya evînê kir
Min û dilber di vê rê da
Pitir ji Mem û Zînê kir

Şekirlêvê, me na xêvê
Xemla revê qehir çêkir
Beramber te gunehkar im
Gelo dilber, eve kê kir?

Agir berda hinavê min
Tîzab û xwê li b'rînê kir
Berê dara evîna me
Ne me dît û ne me jê kir

Ji nû dîsan bi dijwarî
Pîrê evîn şekir lê kir
Hezar tirken bila rabin
Eve dîsa' me destpê kir
Botanî ger nependî bû
Wî xwe gorî şirînê kir


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Li ber dengê dehola kurd

Vê carê jî ji min birin
Navê revê kirin serbar
Li ser kav'lê evîna min
Hezar kundok kirin serdar

Roja debeng û lewçan e
Bi te şad in weko her car
Ji lew dilber dinalim ez
Bi vî dengê melûl û jar

Ji ferhenga dilê xemgîn
Bilind dibin qêr û hewar
Çi gazind û gilî û maç in?
Ji te d'barin gula nazdar

Bi bêhn in ew, ji me naçin
Cerg û hinav li min hat xwar
Dixum sûndê nerawestim
Heta li te nekim bihar

Te b'xemlînim cwana cwanan
Biderbînim jana kevnar
Li ber dengê dehola kurd
Xwe h'lavêjin pale û cotyar

Nêr û mê bin, weku êk bin
Dem û gavê, hemî hişyar
P'rêzên zêrîn biparêzin
Bi xebata tûj û dijwar

Bi xwîn û xwêdana ewan
Xêr û xweşî rojê hezar
Bi dilşadî bikin dîlan
Dîsa' li nav gund û bajar

Li rojên cejn û sersalan
Bixemilin sûk û bazar

## Gulbihar û mêşa hingivînê

*Gulbihar:*
Ka ew hing'vînê cara'
Di nav wan teht û dara'

Were mêşê derwêşê
Zîrekê zehmetkêşê

Lêva min a lîlozî
Bo te cejnepîrozî

L' şûna gul û gulzara'
Min bimije wek yara'

Evînî xweş evînî
Xwînê bike hingvînî

Ji vê xwîna pir paqij
Tijî awaz û lavij

Awazê jîna rastî
Hemî evîn û aştî

Bike hingiv bo mala
Bo cotyar û bo pala

Bo Şahîn û rewşenê
Bo Yonan û Gulşenê

Bo her kesê zikbirsî
Ji bêkesî çirmisî

Ji nêza ger ji derda'
Li hemî war û erda'

Were mêşê gulmijê
Pîroz e warê tu jê

Behişta bîr û çav e
Gul û bilbil di nav e

*Mêş:*
Ev çi pesn û dîrok in
Çi gotin û çîrok in

Qet hew nabin gote got
Gulê te cerg li min sot

Çîrok û çîvanoka'
Vehîne bo zaroka'

Ev e bo te sed girov
Hemî nîşan û dirov

Hirça' şane nehêlan
Ez ê li çol û bêlan

Hing'vînê min keriftin
Şilx û şane heriftin

Hirçê pîsê devgenî
Min digotê ezbenî

Tivtiva mêş û gula'
Ji hemî rex û mila'

Hingiv rija ser xwînê
Rebî kafir nebînê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Dîsanê me destpê kir
Hing'vê şirîn me çêkir

Mêşên me wê d'livlivin
Bi dilgermî d'tivtivin

D'mijin şîrava gula'
L' ber awazên bilbila'

Hema ko me kir tivtiv
Bixun her bixun hingiv

Kar dikim bo mirova'
Guh nadim hirç û hova'

Gotina te ji dil e
Lêva te ya bilbil e

Lêva te ez namijim
Bilbilê te nakujim

Here gulê delalê
Wereve serê salê

Gel hogir û hevalan
Diyarî b'xun ne b' talan

Xelat e, xweş xelat e
Xêr û xweş'ya welat e

Bo wan zarokên sava
Bo xwarna bûk û zava

Di gel maç û silava'
Xwedê mala te ava

## Gulbihar û bilbil

*Gulbihar:*

Bilbilo hunermendo
Bêzincîr û bêqeydo

Kacê bilûlê bîne
Xemên me pê b'revîne

Gula Ç'yayê Şirîn im
Bilbil ez dilbirîn im

Hatim çiya bibînim
Narînka' bo bixwînim

Raser co û cobara'
Li van dol û nizara'

Gazî bikim hey hawar
Gengê bêtin ew bihar

Xwe h'lavêjim wek cara'
Li nav gul û gulzara'

Bilbilo bilûlvano
Dengxweş û dilkovano

Awazên te »yasîn« in
Rondikên me d'barînin

Bes bixwîne »Yasînê«
Were qêr ke narînê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

*Bilbil:*

Gulê bes e xemgînî
Mizgînî sed mizgînî

Dîsa' dê bêtin bihar
Di gel lawê ne diyar

Xeman ji dil derînin
Xweş bihara' bibîbin

Hûrik-hûrik dê lêkîn
Lîs û hêlîna' çêkîn

Li nav dar û berava'
Hingê tu bûk, ez zava

Dîsa gulê hey narê
Ber sêbera vê darê

Vêk ra qêr kîn narînka'
Ez naxwînim Yasînka'

## Dibin gorî te gulnazê

Eger bimrim dîsan rabim
Ji dîdara te têr nabim

Eger jînî, eger jan î
Tu xweşiya dil û can î

Wek min gelek nependî bûn
Kurebab û efendî bûn

Agir barî l' evîndaran
Çi hat serê birîndaran

Dîtin gelek teng û tarî
Ji rêça te nebûn varî

Kê dîtiye, an zanîye
Malxwê malê biyanî ye

Xemla revê borî ne ma
Ka seyran û keyf û sema

Ne dûr in ew ji daxwazê
Dibin gorî te gulnazê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Strana gulbiharê

Kurko dîno tengî kurt in, ez bi gorî
Ha ha, te dî weke xewnek giran borî

Kurko dîno xewka min tê tu nahêlî
Çawa diçî welatê xerîbiyê û min dihêlî

Çeto lawo şermê bike ji navê min
Ji wê xwîna tête xwarê ji çavê min

Şirînê ber dilê mino, xwe bike ewrek reş û tarî
Hûrik-hûrik bibarîne ser vî warî, li vî aqarî

Lo lo gidî were tu malxwê be, ez kabanî
Ala evîniyê dîsa' hilde ser vî serî, li ser wî banî

Delalê dilê mino, çenda bêjim hêj û wê ve ye
Were were, şeql û hêla te pê ve ye

Gidî lolo, tu xweşmêrê min î, ez dilbera te me
Were bi Şêxadî, kesk û sor û zera te me

Xweşî û tenahiyê bîne dîsa' bo vê malê
Bi derzîka min sêwîkê bixemlîne rengê alê

Çeto lawo, ez welat im, ez welat im
Lo lo gidî, her nûjen im, tirh û kat im

Li zozanê evîna dila', bila helbin hezar çira
Di govenda min û te de, xwe hilavêjin bab û bira

Çeto lawo, tu xweşmêrek aştîxwaz î
Lê ko nebû, bi xwînê jî min dixwaz î

## Her erê me

Dilbera yar jê biyanî
Kanîka derd û ziyanî
Her erê me, her erê

Hevalê dost û yara me
Her evîndarê cara me
Her erê me, her erê

Jar im gel jara' jiya me
Xetîra serê çiya me
Her erê me, her erê

Rêving im, serneçemandî
Çîroka jînê vehandî
Her erê me, her erê

Vê derê, ger wê derê me
Ba û bahozê wek berê me
Her erê me, her erê

Wêrek û zîrek her demî
Ez ne ew im, yê demdemî
Her erê me, her erê

Seydayê rewşa revê me
Pepokê nîvê şevê me
Her erê me, her erê

Her jar im, jarê jarê me
Girtiyê dava yarê me
Her erê me, her erê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Her erê me, wek berê
Her erê me, wek berê
Her erê me, wek berê

## Mêr û qelsemêr

Ê dil ji dil daye Zînê
Bawer neke, ew westiya
Ê daye ser şopa durist
Bawer neke ew tirsiya
Her dem li pey doza xwe ye
Ta serkevê, yan jêr piya'
Evîndarê heqê rewa
Ser jî biçit qîr û siya
Jîn û mirin têde yek e
Heqperês e lew ko viya
Wî rê vekir bo zakê nû
Da xweş bikit çol û çiya
Wan zeviya avis bikit
Bi hêzê van zikbirsiya'
Paşerojek têr û tena
Bo rêncbera' û bo gundiya'
Ê nedîtî xemla revê
Ma çirmisî, wê neşiya
Kesê vema, xêr tê nema
Qelsemêr e ew bizdiya
Kul û kovan man li dilî
Ne ew mir û ne zak jiya


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Me got belkî

Pirsyar ji min kir û got
Bo çi herdem dinalî
Mi' go' dilber tu zanî
Min dest û pê di dava'
Tîra kevanê te bû
Berdam çol û beyara'
Şev ta seher dinalim
Min ax û ox j' h'nava'
Dinalim ez şev û roj
Wekî bilbil ji bo gul
Êş û elem hezar in
Li min jana zirav e
Evîna te şepalê
Kirim Memê zîndanê
Tu xeyala dilê min
Li hemî dem û gava
Me got belkî berhev bin
Simbêl û cotê sêva'
Bikîn keyf û civatê
Wekî du berxên sava
Got derwêşo bes binal
Ji wê dilê xwe yê kul
Yadîgar im ji bo te
Bi rengê bûk û zava

Têbînî:
Min (Sebrî Botanî) ev parçe ji devê mela Mehmûdê Dêrşewî wergirtiye, lê mixabin paşî kêmasî ketê û bi min nehat rast kirin.

## Her evîndarê caran im

Kuştim sihra pîrhevoka'
Pilpilok û niviştoka'
Ax filmê seyr û sînema
Te nav û nîşan jî nema
Ey fincana rev û ravê
Şerbeta xwîn û xunavê
Soz bit êdî reş nepoşim
Fincana qehrê nenoşim
Ne ji van û ne ji wana
Ez ne kêşim derd û jana'
Xwe bikim haveynê jînê
Bidirînim zikê kînê
Her evîndarê cara' bim
Birîna cergê jara' bim
Ez im yarê Gulbiharê
Dîsanê wek hemî carê
Kanîka ava xebatê
Dîsa' berdim ser wê latê

# Ez û dapîroşk

Çi xweş kar bû ew a te kir
Bo M'hemed û Eba-Bekir
Bi wê tevna te raçandî
Davdav li şkeftê alandî
Hezar kîndar pê xapandî
Pîroz e yê tu banandî
De bo min jî karek bike
Ji sed cara' carek bike
Evro ez jî derbider im
Hevalbendê pêxember im
Heta kengê hêvîdar bim
Dem û gavê kilîldar bim
Vî dêwê ez kirim derê
Cuda kirim ji dilberê
Berx bûm ji ber makê kirim
Yar bûm gorî Fatê kirim
Ez pîr kirim derd û xema'
Dil kuzirî serbir nema
Nehêla ez bibim zana
Kirim maka êş û jana'
Pîrepindê xweşhanderê
Tevnê vede l' wê navberê
Tevna sipî giş tentene
Bi wan lepên hûr mengene
Baş vehîne wan hîzara'
Rengê xunav û xûsara'
Tevna zîvîn pê raçîne
Şehê zêrîn pê da bîne
Çavan li dêw tarî bike
Rêçan li ber varî bike

Der bit birîna sîngê min
Serê çepel jêr lingê min
Hingê vêca zerkeş bike
Dilê melûl pê geş bike
Bo gula min keşkeş bike
Bilbilan pê serxweş bike
Gula min e şengejin e
Min dil ser e, wê l' ser min e

# Gazindek ji dilberê

Te rêça me nezanî
Te çi b' serê xwe anî
Reşperdeyek te h'lanî
Li ser sîngê min danî
Lewre qelengiran im
Meydana derd û jan im
Bê govend û dîlan im
Her dem li jêr pîlan im
Amanca dilpîsan im.

Têbînî:
Wek ez (Beşîr Botanî) dizanim ev helbest dirêj bû, lê babê min winda kir. Êdî xêzên ko hatin bîra wî tenê ev in.

# Felek dest e

Mêr û jin
Ciwan û mezin
Her dibêjin
Ax ax felek
Zalim felek
Xaîn felek
Feleka çi?
Sitema çi?
Heşa çi?
Felek nakit
Felek nadit
Ne bû û nabit
Felek zeman e
Bê veman e
Zeman dest e
Kirin şert e
Barê me ye
Karê me ye
Bi destê me
Tê bextê me
Hiş serwer e
K'rin gewher e
Felek nîne
Kirin jîne
Jîn sitewr e
Dem û dewr e
Tu paqij ke
Tu avis ke
Da ko bizê
Ji te bizê
Bo me bizê
Felek ev e
Jê nereve


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Newroz cejna kurda ye

Me newroz e l’ bin daran
Cejna me dost û yaran
Newroz cejna kurda ye

Newroz e cejna jînê
Memê gihaye Zînê
Newroz cejna kurda ye

Cengîz di gel Eyşê ye
Simko di gel Xifşê ye
Newroz cejna kurda ye

Kesek li mal namînê
Rabe gulê da b’çînê
Newroz cejna kurda ye

Zozanê ban kir Lezgîn
Sînemê gote Gurgîn
Newroz cejna kurda ye

Lawîn berda Pîrozê
Silo hat cem Lîlozê
Newroz cejna kurda ye

Hogir li ser darê ye
Li tenişta yarê ye
Newroz cejna kurda ye

Memo çû cem Gulşenê
Gazî bikin Rewşenê
Newroz cejna kurda ye

Şahîn di gel Şîlanê
Ew jî hatin dîlanê
Newroz cejna kurda ye

Fatim gula hemyan e
J' bo vî dilî semyan e
Newroz cejna kurda ye

Hin gul in, hin bilbil in
Gul û bilbil yek dil in
Newroz cejna kurda ye

Rabin gelî hevalan
Êvar e çaxê malan
Newroz cejna kurda ye

Gundê Mayê, sala 1961-ê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Cotyar û zevî

Zevîkê ez negêj im
Te j' bîra xwe bavêjim
Bizane ez çi d'bêjim
Kul û derdan ved'rêjim

Ser û bin jan û êş im
Hew vê janê ved'kêşim

Heke te neparêzim
Bizane ez ne mêr im
Zevîkê bo te d'bêjim
Na tirsim ez diwêrim

Mêr im têra xwe fêr im
Xwedanê tevr û bêr im
Cotyarê destqilêr im
Nev'yê Kawey' Dilêr im

Soz bit, yan te bikêlim
Ji bo zordar nehêlim
Serê çepel vehêrim
Nav axa te veşêrim
Yan xwîna xwe birêjim
Hingê pitir dihêjim
Serbest û şad û têr im
Şehîdê xakê zêr im
Li cem milet bi rêz im
Li cem milet bi rêz im.

# Viyana miletê min

Viyanê heq diyar kir
Bi xebata sor û sext
Çaxê sitem raborî
Wêran dibin tac û text
Koşka qiral tepisî
Lê wergera text û bext
Ger bivên û ger nevên
Lez û dereng têtin wext
Ji dil eger bibin yek
Kurd û ereb dest bi dest
Jêr sêbera wekhevî
Ava dibin çiya û deşt
Tê de bijîn wek bira
Vêg ra azad û serbest
Welatê xweş û şirîn
Dê bibit bax û beheşt

Mûsil, sala 1958-ê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Yara nazenîn

Tu yî behişta rengîn
Gul û rîhan û nesrîn
Tu yî jan û tu yî jîn
Dilber, tu yî, tu yî Zîn
Ez im Memê dilbirîn
Bextreş ez im ser zemîn
Tu yî baxê sor ji xwîn
Tev rondik û derd û şîn
Gelek Enwer û Gurgîn
Şîn û Şahîn Lezgîn
B' jîna biha tu kirîn
Qelen dan û têperîn
Ew in şehîdên evîn
Bo te yara nazenîn
Ji Yezdan re aferîn
Kirim pîrê xemcivîn
Hiştim melûl û xemgîn
Hêşta jivanê mizgîn

Amêdî, sala 1964-ê

## Qelenê giran

Rûbarê xap û pîlan
Her jê diçit xwîn û zêr
Jêr sitema bê pîvan
Sêwî dikin qêreqêr
Bê derman û cil û nan
Rojek birsî, yek nîvtêr
Birîna derdê giran
Hemî kirin şoreşgêr
A'grê vîna serbestî
Ket'ye dilê jin û mêr
Yan azadî, yan mirin
Dinya bûya xebatgêr
J' bo qelenê azadî
Her divêtin xwîn û zêr
Karwan diçit ber bi jor
Venagerê ber bi jêr
Pêş da diçit gav bi gav
Li pey rênasên dilêr
Tengav bûye koledar
Pîrê lawaz û newêr
Şengedara wî rizî
Rûvî êdî nabit şêr

Mûsil, sala 1956-ê

## Bihara welatê min

Bahoz û bager û baran
Neman, çûn û welat berdan
Befra sipî rewşa ciwan
Li ser serên çiya hêlan
Nema êdî mij û moran
B' şîn û girî revî zistan
Geş bişkivî rengê cîhan
Xweş xemilîn mêrg û zozan
Bi nêrgiz û gul û rîhan
Dema rengîn cejna zeman
Li her cihî keyf û seyran
Çiya û sûlav, bax û bistan
Mîna behişt in bê guman
Bang û awazên bilbilan
Hiş nahêlin bo sorgulan
Ev nêr û mê j' hemî rengan
Bi dilşadî dikin dîlan
Nemaze Newroz û nîsan
Hey aferîn ji bo Yezdan
Her ava bit cihê kurdan

Hiror, newroza 1962-ê

## Çavenêr im

Ji evîna te bû dilber
Giham çola waweylayê
Kul û derdan hilavêtim
Kelemper bûm li ber bayê
Dîsan mûyek ji te nadim
Bi sed Colêt û Leylayê
Li pey te me, çav li te me
Heta mabim li dinyayê
Her nûjen im di vê rê da
Xwegir ez im ber belayê
Ev e soza min û cwanê
Birîna reş bizav dayê
Ji wê dîlana germ û geş
Awazê jînê berdayê
Çavenêr im bibim zava
Kî dibêjê duşeş nayê?


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Şivan

Têm û diçim deşt û şax
Derbaz dikim dem û çax
Ber sêber û hetava’
Ser nefel û berava’
Car nizar û car pesar
Mêrg û çîmen avên sar
Bilbil û kew dixwînin
Xeman ji dil d’revînin
Pezê xwe lê d’çêrînim
Berx û kara’ d’mêjînim
Seyê min tim hişyar e
Neyarê gurgê har e
Nêr’yê kever pêşeng e
Zengil b’ qêr û deng e
Ko pezê min diborê
Ez pif dikim bilûrê
Pezê xwe pê d’civînim
Xemên xwe pê d’revînim
Ev karê min xebat e
Ji bo min û welat e
Ez pak û çak û baş im
Her dem dilxweş û haş im
Dosta min pir delal e
Xweş hogir û heval e
Gava ko tê bêriyê
Ez dibezim pêşiyê
Bi lez diçim dibînim
Des gerdenê wertînim
D’ramûsim dev û lêva’
Jê distînim du sêva’

Şivan hemî dilpak in
Bo mêvana’ pir çak in
Koda şîrî bade ye
Şev û rojê her heye
Her dem heye nan û şîr
Carcar pîvaz û penîr
Gund û cîran dizanin
Ko şivan bê ziyan in
Dixebitin bê westan
Dilpak in bo Kurdistan
Rojên befr û bagerê
Pezê xwe nakin derê
Tev li mala’ dimînin
Cîrana’ baş dibînin

Bamernê, sala 1965-ê

## Bextê vajî

Gelo bo çi ev jiyan
Tev bûye jan û ziyan
Kesê baş e, li paş e
Li pêş wî rêl û kaş e
Aşê wî çep digerê
Felek ji wî nagerê
Her varî ye bextê wî
Tim vala ye destê wî
Ji vî bextê me yê reş
Zanîn li me bûye heş
Her lawaz û belengaz
Şev û rojê xwezîxwaz
Xwezî li sala par e
Ne derman û ne çare
Jêr sêbera mam qazî
Her dem hawar û gazî
Bi ser û çav mirov e
Karê wî karê hov e
Jêr sitem û ferman în
Pir derd û bê derman în
Evro bûne sê heval
Wêran kirin li me mal
Xweş heval in bes bi dev
Rojê li me dikin şev
Jêr pê kirin mafê me
Winda dikin navê me
Keysperês û gernas in
Pîs in, xwedênenas in
Girêdane li me çav
Em hêlane sist û xav

Her çi heye birin tev
Pir fihêt e bo me ev
Gelek şerm e em razî
Nezan û birsî û tazî
Bê hêz û bend û sazî
Rizgar nabîn ji qazî
Dixwazim hêşta bêjim
Kela dilî verêjim
Lê çi b'kim ez ditirsim
Neşêm pitir bipirsim

Zaxo, sala 1957-ê


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## Keçê gulê ka mizgînî

Gulê cwanê te ez birim
Ji dinyayê ez derkirim
Dinalim hawar û gazî
Tu nabêjî, tu çi d'xwazî
Nê paleyê bejna te bûm
Li ber têhn û bêhna te bûm
Evîna te ala min bû
Dar û devî mala min bû
Serê min bû huner tê da
Felek hat û çerxek lê da
Evîn firî, huner kuştin
Dilê xemgîn bo te hiştin
Heta kêzê hate rêzê
Neçar bûm ez bikim bêzê
Ji mêj ve min qelen dabû
Zalim hêşta te dil dabû
Ala evînê hildabû
Çavê reş bo min kil dabû
Di zîndana kul û derda'
Ronahiyek hate serda
Te hêj divya bac û xelat
Çi b'kim dilber ji min nehat
Hatim hatim negehiştim
Kesîre bûm ez rûniştim
Qêrek hat û hêzek da min
Çi tîrek bû te berda min
Evîna te pir aloz e
Mij û moran û bahoz e
Jehra serê koremarî
Hate ser vê jîna tarî

Kirim derwêş li Bexdayê
Çaverê me xeber nayê
Hawîr min tev kul û derd e
Esîrê xwe demek berde
Dizanim hunerek maye
Bahoz û agir û ba ye
Bi vê çendê jî razî me
Bê gazind û bê gazî me
Eger dîsa' bo min vejî
Dê xwe kujim eger nejî
Bawer bike dilpaqij im
Pesn û evîn û lavij im
Xwezî bibam gul û giya
Wek rebenê çol û çiya
Te ez kuştim gula şirîn
Dil herişî tev bû birîn
Heyf e bimrim bi xemgînî
Keçê gulê ka mizgînî?

Bexdad, sala 1975-ê


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

# Rabe ser xwe ezgorî

Yasa çewt e, rejîm vajî
Çewt û vajî her gîz najî
Rast û çep ne wek hev e
Çerx û ola gerdûn ev e
Bê jimar ol û Yason
Yek ji wan ola Mason
Aloz kirin jîna mirov
Har kirin nezan û hov
Viyana rojgar e ev
Ta ko ma bin roj û şev
Gelo eve çend sal e
Jîna me tûj û tal e
Evro tu bîrbelav î
Lewre di bend û dav î
Rast û durist bêje mast
Bes biley'ze çep û rast
Ger tu jîr û çeleng î
Bo çi hosa' bêdeng î?
Wêrek be qet ne tirse
Weke mêran bipirse
Kanê xak û avên me
Ka nîşan û navên me
Bilind bike dengê xebat
Geştir bike rengê welat
Bêje mêr im, qet narevim
Şareza me, ez na kevim
Sed tif li min ger rakevim
Ji doza xwe ger dakevim
Heta kengî dilteng î
Ma ne bes e bêdengî?

Xêr û xweşî revandin
Cergê me pê helandin
Dinya ye, paş û pêş e
Ber û vajî vekêşe
Çi ne ev Nûrî-Mûrî*
Rabe ser xwe ez gorî
Vî golikê sermezin
Jan kir dilê mêr û jin
Kesê giha ber derî
Bi lez dibit serserî
Ker û golik bilind in
Ya me gilî û gazind in
Xwe ji rê varî neke
Çavê xwe tarî neke
Xwînê bide erdê xwe
Derman bike derdê xwe
Azadiyê bistîne
An jî bimre, nemîne
Ma dem azadî nîne
Mirin ji bo te jîn e

Zaxo, sala 1957-ê

*Nûrî: Ez (Beşîr Botanî) texmîn dikim Nûrî Seîd e, yê ko di wê demê de serekwezîr bû.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Zêrê bêxêr

Zêrê bizava wî nebit
Ji bo nan û derman nebit
Zikê birsî pê têr nebit
Dilê sêwî pê nêr nebit

Ji bo derdê milet nebit
Kunca tarî pê ron nebit
Jîn û jiyan pê geş nebit
Ma bo çi ye bila nebit
Bila nebit, bila nebit

Çavê xudanî derkevit
Heta sax e rûspî nebit
Bimrê kifin peyda nebit
Agir di gora wî de bit
Dozex di rêka wî de bit

Zaxo, sala 1957-ê

## Van kesan binasin

Dipîvin û dibjêrin
Çawa' bivên dijmêr in
Zimanlûs û pirbêj in
Şekir ji dev dirêjin
Çol û çiya dikêlin
Bostekî jê nahêlin
Sed sinûra' dişkênin
Bi dev welatparêz in
Eger çi dilqirêj in
Mara' tê da ved'şêrin
Şareza ne, ne gêj in
Gelek fêlbaz û fêr in
Ber çav gernas û mêr in
Şêr û şoxên bajêr in
Ji her rexî diçêrin
Li her aşî dihêrin
Perêsên mal û zêr in
Diçêrin û dikêşin
Binasin, derd û êş in
Binasin, derd û êş in.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Min bi çavê min bibîne

Ne bê çav im, dibînim
Ne bê hiş im dipîvim
Hizirtûj û dûrbîn im
Dijminê kerb û kîn im
Lê sitemê ez xwarim
Kengê ez gunehkar im
Bi talan çû Zîna min
Janê da birîna min
Hozanoka' ved'hînim
Bo zaroka' dixwînim
Eger kak im, biramak im
Bihêle ez temaşa kim
Ger nizanî heye, nîne
Min bi çavê min bibîne
Kinoj tu yî bê hember î
Lêvok tu yî, tu qeşmer î
Nabim zirtek bo qeşmera'
Ne ser çava', ne ser sera'
Ger tu bêjî ev çênabit
Bitirse ko lehî rabit
Ya te kirî û ya te gotî
An te birî, an te sotî
Dikim çîrok bo sêwiya'
Pê sax dikim sed hêviya'
Tif li min û li karê te
Li sed par û pararê te
Li peyk, ziman û zarê te
Li xelat û dînarê te
Rabim rûnim her eve ye
Ez çi bêjim, her bive ye

Bi xwîna xwe min rê vekir
Bi dilxweşî wekî şekir
Da b’ rondikên keyf û kenê
Bigehme sîngê Rewşenê
Xwe jê bikêşe hey teres
Heta kengê, ma qey ne bes?

Colemêrg, 2-yê gulana 1975-ê


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## Bo dîndarê xwînmij

Hey zikreşê dilmiştqirêj
Tu bes bimîne şaş gêj
Ko xwînmij û birakuj bî
Te bo çi ye rojî û nivêj?
Sed tif li nav çavên te bit
Neke nivêj, xwînê nerêj
Ne j' bo kera' bûye peyda
Ew behişta pan û dirêj
Tu req bibî, tu nabînî
De her bibêj û her bipêj

## Kovara Birayî

Birayî, tu birayî
Mîna find û çira yî
Pir pir giranhiha yî
Zaka hezar zana yî
Pir zana û şareza yî
Cergê hezar çiya yî
Dengê hemî kurda yî
Gula hemî desta yî
Li ser hemî lêva yî
Dermanê derd û ta yî
Tu daxwaza dila yî
Pîroz roja tu zayî

Sala 1967-ê

## Ez gul im, tu gulçin î

Van hozana bes vehîne
Weke mêran xwe b'gehîne
Hey delalê dilê Fato
Evîna te kirim pato
Yara te me, her ya te me
Ez dilber û zerya te me
Canê şirîn bike xelat
Heke hat û heke nehat
Ma dem ji bo bejna min e
Nehatin jî, her hatin e
Xwe rapêçe ji bo jînê
Wêran bike qehr û şînê
Ji nû dîsa' da ez vebim
Heta hebim, her bo te bim
Ez her gul bim, tu gulçin bî
Ez bo te bim, tu bo min bî
Gul û bilbil, keyf û sema
Hemî gav û hemî dema'

Akrê, sala 1963-ê

# Gulbihar û kotir

*Gulbihar:*
Kevoka haş û kedî
Binvîse her çi te dî
Niklokê te qelem e
Binvîse xweş û xem e
Ne reşspî, ne spîreş
Ne geşçirmisî û ne çirmisîgeş
Bajar û gund û welat
Bilind bif're lat bi lat
Li ser çol û beyara'
L' hemî war û eqara'
Bibîne halê dinya
Çi Afrîka û çi Asya
Li her welatê jêrdest
Zordarê pîs û bêbext
Dinyayê baş bibîne
Rastiyê bo min bîne
Ne wek peykê koledar
Beramberî sitembar
Çi Lenden çi Îsraîl
Nahom dikin 'Îzraîl
Xurme dibit leblebî
Xirpo dikin çelebî
Mêşek dibit sed gamêş
Derwêşo bigre û bikêş
Ey kotirka sipîreng
De bo me jî bide deng

Lezke bif're ne gîr be
Sivik û peyt û jîr be


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

*Kotir:*
Ey hevala aştîxwaz
Ey xemxora belengaz
Dibêjin aştî aştî
Lê pir dûr in ji rastî
Nê aştiya koledar
Yanî serê koremar
Firîm bo Felestînê
Yan bêje gula xwînê
Moşê li ser dixwînê
Kî derman kit birînê?
Min gote wan xogira'
Ey heval û hogira'
Ag'rê şerî geş bikin
Ruyê dijmin reş bikin
Kilîla aştî şer e
Bisojin hişk û ter e
Wêran nebit mala we
Bilind nabit ala we
Bi gurzên van egîdan
Bi xwîna wan şehîdan
Bistînin bajar û gund
Jêr ala şoreşa tund
Koledarê pîs û ker
Her dê bişkê seranser
Welat welatê we ye
Xak û xelatê we ye

Lawno va ye berdest e
Bi we evro serbest e
Bi xebata milên we
Bi germiya dilên we
Dijminê xwe bikin hîç
Rizgar bikin zar û zîç
Dîsa' heval ez firîm
Her firîm û her firîm

Şeveka reş û tarî
Befr û agir dibarî
Dol dol firîm bo gelî
Ne S'lêman û ne Elî
Ka Şahîn û ka bengîn?
Gelo pa kanê Lezgîn?
Ez bi lez im, ditirsim
Min kes nedî bipirsim
Ç'yayê bilind û mezin
Dêw li hawîr dibezin
Piç piç ji rê derketim
Hêdî hêdî serketim
Hatim jêr û firîm jor
Gul û giya xwîna sor
Rêl û pesar û çiya
Dar û dirext û giya
Sor in ji rengê xwînê
Cergê mirov dertînê
Min xwe berda ser piya'
Gazî dikim gundiya'
Ketim kaş û kendala
Heta giham nêv mala'
Gundê çi? Wêran û çol
Tevde bûye xak û xol
Kanê mal û kanê hal?
Ne heram û ne helal
Çûm koza berx û kara'
Meydana mişk û mara'
Tif tif li te ey felek
Ka Fatmoka çavbelek?
Janê avêt vî dilî
Ez ji kê bikim gilî?

Bexdad, 5-ê îlona 1975-ê

## Ger ne wilo bim

Hawar û fîxanên çarereşan
Peykê hemî dem û gavê' min e
Derîzana evîna wan bêkesan
Rûgeha dil û can û çavê min e

Dilovan im dilovan, hey ez bi qurban
Weko seyê ber derî me
Ger ne wilo bim ey cwana cwanan
Hingê bizan, çend bêrûmet û serserî me

Têbînî:
Ev helbest kêm e û tenê ev du bendên he dihatin bîra babê min.

## Peyman

Soz bit sozê neşkênim
Her bimînim xakperwer
Ger leşê min seranser
Pirt pirt bikin bi xencer

Evîndarê gulê me
Bi can û bîr û bawer
Jana evîna gulê
Girtiye can û ceger

Şox û şepal e dilber
Destê çepel maye l’ ser
Pir fihêt e ji bo min
Ger nestînim gula zer

## Ey keça kurd

Ey keça kurd, ey keça kurd
Zû hilo derkev ji gov
Lez bixwîne, baş bibîne
Da nemînî nîvmirov
Ma ne şerm e her bimînî
Bê amanc û bê dirov?

Ey keça kurd, ey keça kurd
Zû hilo derkev ji gov
De hilo rabe delalê
Tu ne bî şîn, na bit tov
Bo tovê jîna welatî
Bê guman her tu yî şov

Zaxo, sala 1950-ê

# Gulbihar û pelîtank

Dûtra rojê l' ser banî
Mi' l' ser milê wî danî
Ya te gotî, min ew got
Ez di gel xwe kirim cot
Gulê pa keyfa wî hat
Maçek bo min kir xelat
Gote min bêje Fatê
Bê min ne çit civatê
Gulê ji nû min zanî
Yarê te ye Botanî
Gotinek kir wek şekir
Wî dilê min pê vekir
Pir xweş û nerm û têrtam
Şîr û şirîn şekrê şam
Hingê gava paştir bû
Şirîntir û baştir bû
Gulê nadim malê d'nê
E'l' ser wê têm kuştinê
Li ser wê tirh û katê
Agir û befr û ba tê
Ewrê evîna caran
Dîsa' kir ag'r û baran
Ewrên me reş û tar in
Şîn û şadî dibarin

Sala 1967-ê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Gula evîna min

Pir pir ciwan rengê te ye
Ehmed Xanî dengê te ye
Barzanî ser cengê te ye
Kerkûk û Şengala minê

Soza dil peymanê te ye
Xwîna min dermanê te ye
Min çav li fermanê te ye
Tu cejn û sersala minê

Ç'yayê Cûdî bejna te ye
Xemla Newroz cejna te ye
Dilsotiyê dît'na te ye
Rengê te ser ala minê

Me dil evîndarê te ye
Ji mêj ve xwîndarê te ye
Pêşmerge guhdarê te ye
Rewşa te pergala minê

Ez bang û hawarê te me
Xîçek ji nîgarê te me
Hişyar û xemxwarê te me
Hey xaç û hîlala minê

Deşta Zê, sala 1961-ê

## Pîra şîretvan

Şîretvanê gote min
Guhê xwe baş bide min
Ez im pîra şîretvan
Yara pîrê kelekvan
Dinya ne wek cara ye
Kelekvanî nemaye
Pîro bûye bexçevan
E'jî bûme dergevan
Evro ez dergevan im
Maşalla xwendevan im
Her dem li nav reza' me
Têra xwe şareza me
Evîndara rezan im
Qedrê huner dizanim
Li gor nimra evînê
Hazir be şeva înê
Pîra evîngehê me
Sala şêstûnehê me
Kevnar im, xweşdiyar im
Li nav xelkê navdar im
Were nik dapîra xo
Çi Duhok û çi Zaxo
Evîngehê bibîne
Hunerê wê bixwîne
B' zimanê nerm û erê
Mar ji kunê tê derê
Çi bazbend û niviştin
Nezanînê hûn kuştin
Nê şeva reş û tarî
Diyar e hêj êvarî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Heke rast e natirsî
Bo çi ji min napirsî
Bê çep û çîr tu bêje
Bê xwar û xîç verêje
Ji rastiyê nereve
Karê evînê ev e
Hêdî hêdî darêje
Derdan ji dil bavêje
Soza mêrê hekarî
Gotin zêr û mirarî
Ger nekevim çala reş
Mîna xezala keleş
Dê şola te bibînim
Bere bere bixwînim
Lê kes nîne mîna te
Derman kit birîna te
Şîreta yekê d'bêjim
Kela dilî verêjim
Heke tu jê verestî
Rast e tu gulperest î
Dava gulê tu girtî
Awrên çava' tu kuştî
Marê gulê tu geztî
Ji lew tu jar û mest î
Soza dil û mergê te
Janê daye cergê te
Evîna xweş û dijwar
Ax ji derdê Gulbihar
Xwe berdaye dilê te
Tiştek nayê milê te

Hiş û bîrên te ew e
Wek dî hemî derew e
Hiş û hizr û dilê te
Çav û gav û milê te
Bûne gorî dengê wê
Pêş dîtina rengê wê
Bila best bit badoşî
Tu ne şêyî dapoşî
Evîn ji dil te dayê
Bê agirê jêr kayê
Heta ko evîn heye
Jana wê jî her heye
Xweş'ya evînê derd e
Gulê bigre û neberde
Bê wê dinya wêran e
Kav'lê kevnedêran e
Bi lez û bez here nik
Wê gula hestîsivik
Bibîne en'ya kever
Canê şirîn dane ser
Dilê birîn bo veke
Vê gotinê j' bîr neke
Li ahengên şevînê
Fêr be dersa evînê
Bibînin hunerê hev
Têr baxivin roj û şev
Hezar xwedan »macistêr«
Ku diyar in wekî stêr
Hemî seyda û efendî
Li ser dibin dubendî
Cotyar in, ger şivan in
Eger pale û rezvan in
Hemî mêr û mêrxas in
Yek yek gulê dinasin
Awaz û hunerê wê
Bîne bela serê wê
Kes nema xwe lê neda

Wê dil bi kesê neda
Kê dîtiye wek nuha
Huner ma bit bê buha
Li jêr simê kerê reş
Diperçiqin gulên geş
Sitema dêwê kirêt
Ez kirim agir û pêt
Ax ji destê vî dêwî
Huner hêlaye sêwî
Hezar wek min şêrejin
Ji dil û can dihejin
Baca evînê xwîn e
Mem û Zînê tu b'xwîne
Bes bike lavelavê
Mil bide ber bizavê
Bi hunerê sax û germ
Bi xeyala pak û nerm
Huner bike hezareng
Bi hostayî bide deng
Huner ne wek elmas e
Bihatir e û binase
Bi huner tu hingavtî
Di gel xwe tu bişavtî
Hûn hatine bişavtin
Evîn nayê veşartin
Vê janê bîne derê
Nem're bi vê kederê
Were bike piyasê
Tu guh nede qiyasê
Nebêje dem bihorî
Pîr nabit gula corî
Her dem keç e, bê mêr e
Bi hunerê xwe fêr e
Ag'rek pîroz û pêt e
Huner nebit kirêt e
Evîniya bê huner
Tifa min û te li ser

Gula xwe sor û zer ke
Xemla huner li ber ke
Taca evîn li ser ke
Kula dilê xwe der ke
Vêk ra bijîn bi aştî
Evîna pak û rastî
Neha berde ser deha'
Geş bike sal û meha'

Şeraniş, sala 1963-ê


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## Gulbihar û xalxalok

Şîrînê xalxalokê
Rengînê delalokê
Xalxalokê b'lezîne
Deşt û çiya b'hejîne
Ha bigre vê pisyarê
Evîna dilê yarê
Here mala xalê min
Gazî ke hevalê min
Ji malê bêtin derê
Xatrê dilê dilberê
Bêtin han û hewarê
Ser kanîka qesarê
Min hiş û bîr nemaye
Gelo bo çi vemaye?
Canê şirîn bo wî ye
Bê wî evîn bo çî ye?
Xalxalokê biriştim
Bo çi hosa' vehiştim
Li ser darê dinyayê
Bê wî min sebir nayê
Fatmoka çavbelek im
Ber dilê wî gelek im
Ew dil e, ez kakil im
Yanî ko nîva dil im
Ez gul im, ew bilbil e
Evîna me ji dil e
Dilê min textê wî ye
Kilîl bi destê wî ye
Çîçeka çilkezî me
Tinê li nav rezî me

Li ser ava lîlavê
Seyrana bûk û zavê
Dinya me kesk û şîn e
Bihar e, dema jîn e
Tev dar û gul û giya
Wek behişt in ev çiya
Xemlandî ne seranser
Sor û sipî, kesk û zer
Ciwan û geş pîroz in
Gulçîçek û lîloz in
Hezar nifş û nîşan in
Nêrgiz, gul û rîhan in
Keyf û xweşî û seyran e
Firfira perên teyran e
Cot cot in nêr û mê ne
Ji her alî ve têne
Hindek hêşta bê nav in
Li her cihî belav in
Kesk û sor û sipî nin
Têr huner û evîn in
Li gor dilê me saz in
Kew û bilbil awaz in
Ji min kêm e têhna wî
Gul bim li ber bêhna wî
Mizgîn bo te dilê min
Dê bêtin bilbilê min
Tu X'dê ey dil bê xem be
Hişyarê gav û dem be
Ji dûroka bextê min
Bersiv giha destê min
Ez dizanim ew çend e
Seyda ye, hunermend e


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Hunerê wî bo çî ye?
Ger ni zanit gul kî ye?
Gula cotyar û pala'
Van pismam û kurxala'
Pakij dikin deviya'
Nûjen dikin zeviya'
Xweşmirov in mîna me
Nîşan in bo jîna me

Gundê Malta, sala 1961-ê

# Xiyala bê tirs û rev

Çi hişyar û çi xew da
Min carekê xwe berda
Min dî gulê ji wê ve
Xweş dimeşî bi rê ve
Cilê sipî li ber da
Xemla zêrîn bi ser da
Dît'na wê ez hejandim
Ji dil û can vejandim
Hêzê vîna dilberê
Cergê min anî derê
Tîr havêtin ji çava'
Agir berda hinava'
Gulê hat û silav kir
Dinya tijî gulav kir
Gava ko min silav da
Dêmê gulê xunav da
Xweş xelat e, Xwedê da
Wek wê nîne dinê da
Taca huner li ser ser
Ez rawestam li hember
Şepal e wek gula geş
Bûm xulamê çavên reş
Min dest havêt destê wê
Xwe havête bextê wî
Ez demê çûme desta'
Ava Hîzil rawesta
Min ji gulan ew gul e
Kakil e, sebra dil e
Evîna me livlivî
Bihara dil bişkivî

Gul û gulê dibarin
Paxil sêv û hinar in
Baxê hinar û sêva'
Evîn nûsa ye pêve
Awazan mil dane hev
Bi lez me dil dane hev
Got te çi ye lawê pîr?
Min gotê ey gula jîr
Tu b' sehm û nav û deng î
Gula mêrê çeleng î
Kurê welatê te me
Min vexwîne demdem e
Rast e ez lawê pîr im
Lê di evînê jîr im
Evîna pîroz û pêt
Ma ew kî ye ko nevêt?
Dermanê derdê bilbil
Nîne ji bil î sorgul
Hêlm û bêhna te jîn e
Botanî pê vejîne
Lêv ji lêva' dimijin
Gul û bilbil dihejin
Pir hatin cin û melek
Ragirtin çerxa felek
Me hawîr melek û cin
Hezar hezar mêr û jin
Cot cot dihatin rêzê
Kes ji kes na kit bêzê
Pir pir law û perî bûn
Rêz bûn li ber derî bûn
Xweş dihatin civatê
Di gel xêr û xelatê

Heta ko nîvê şevê
Kesek nebû derkevê
Pêta vîna sorgula'
Avêt cergê bilbila'
Ahenga nîvê şevê
Kî kore ye, gul ne vê?
Nêr û mê bûne gelwaz
Hezar zincîr û perwaz
Di gel melek û cina'
Suhbeta mêr û jina'
Pîroz kirin li me kar
Ne carek, lê hezar car
Baqên gula' rêz kirin
Ez û gul himbêz kirin
Gul bi gulê geş dibûn
Bilbil pê serxweş dibûn
Govend û hunerbazî
Hezar reng û awazî
Mey ji lêvan mijandin
Evîn li me şarandin
Ne xewn e ez hişyar im
Bêhna gulê ez xwarim
Gul û bilbil nivistin
Kulek di dil ne hiştin
Merd e hunermenda min
Tiştek ne ma ne da min
Evînê em geş kirin
Ji can û cendek kirin
Kul û keser me der kir
Derdê xwe çareser kir
Xeyalê ez firandim
L' nav stêra gerandim


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Me xem neman di dil de
Stêra' girtin govend e
Di xeyala gulê da
Ketme xêra Xwedê da
Xeyala bê tirs û rev
Ax pa çi qas xweş e ev
Xewna şad û xemrevîn
Keyf û huner û evîn

Gundê Maltayê, sala 1961-ê

## Ey keça baş Gulbehar

Her tu yî ew zêrgula huner lê barî Gulbihar
Her tu yî ew kanîka min jê vexwarî Gulbehar

Ez ji dil dax û birîn im tu çawa yî Gulbihar?
Ma rewa ye her bimînim vî awayî Gulbehar?

Ax ji destê çerxa gerdûn xwar û xîç e Gulbihar
Sed mixabin bo jîna min bê gul hîç e Gulbehar

Min heye kovan dilek ji bo te şabaş Gulbihar
Xweş xelat e ger bizanî ey keça baş Gulbehar

Gundê Pîromera
Duhok, sala 1962-ê

## Were were

Were were, şox û şengê
Te ez kuştim perîrengê
Erê gulê heta kengê?

Heke rast e evîndar î
Ji dil wek min birîndar î
Bo çi hinde ne guhdar î?

Were were sebra dila'
Hey tac û nîşana mila'
Janê da cergê bilbila'

Bi wî dengê nerm û rewan
Awazê bilbil û kewan
Dil ji min bir gula ciwan

Ji awazê germ û zirav
Bibarîne misk û gulav
Belav bike pirs û silav

## Gulbehar û kew

*Gulbihar:**
Kewo spêdê bixwîne
Her bixwîne, her bixwîne
Tu awaza xoş bîne
Her bixwîne her bixwîne
Xelkê rake j' vê xewê
Bihar e, xew şîrîn e
Kewo spêdê bixwîne

Kewo heke tu d'firî
Careka dî d'zivirî
Bersiveka berkeftî
Bo vî dilê şikestî
D' gel xwe bîne hey hewar
Ji wî lawê ne diyar

*Kew:*
Hawar e, gulê hawar e
Hawar e, hey hawar e
Qebqeba min hawar e
Warê me her ew war e
Bihar, ne ew bihar e
Derdê me pir dijwar e
Kewên me jî belav in
Bê pirs û bê silav in
Qebqeb rabin ji xewê
Guh nedin vê rewrewê
Rewrewa tole û tajî
Yê ne hosta bit na jî
Qebqeb biharê bînin


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bûka kurda' b'xemlînin
Qeqebû hey qeqebû
Delîv hat û kes ne bû
Qeqebû hey qeqebû
Ne b' destê min û te bû
Qeqebû hey qeqebû
Ya me nev'ya eve bû
Qeqebû hey qeqebû
Dergehê şadî vebû
Qe, qe, qe, qe,
Qe, qe,
Qe,
Qix

* Ev heft rêzik ji vehînana hozanvanê kurd Hafiz Mayî ne.

## Ez û dilber

Mixabina vê jînê
sotim derdê evînê
ma ne bes e şîrînê

Were şîrînê, cwanê
ji dil derxe vê janê
bila her kes bizanê

Ma bo çi ye ev evîn
jana wê ko nebit jîn
hey dilbera xemcivîn

Tenê tu yî Zîna min (Tenha tu yî Zîna min)
armanca evîna min (daxwaza evîna min)
wêran ne ke jîna min

Dildar im dilbirîn im
Ne şaş im ez ne dîn im
Ez nexweşê evîn im

Dilber tu yî xana min (Doktor) tu yî xana min
Ji bo êş û jana min
Bighe ser min cwana min

Nexweş im ez bêhal im
Şev û rojê dinal im
J'vanê gula şepal im

Qey ne bes e delalê
Te j' min çi ye hevalê
Heta kengê şepalê

Were gulê dilberê
Vê janê bîne derê
Bes bisoje cegerê

Dinalim ax û hey lê
Ma qey tu na kî meylê
Zînê, Şîrînê, Leylê

Xwînê ji dil dirêjim
Ne şêm rastî nebêjim
Çi b'kim zimandirêj im

Tu yî derman û daxwaz
Dilber tu yî, tu yî naz
Ez im jar û belengaz

Ev e, gelek ji mêj e
Were gulê rast bêje
Şekir ji lêv birêje

Ava evîn livlivî
Baxê beden bişkivî
Bo çi tu na bizivî?

## Deng û hunerê Gulbeharê

Xweşawaz in
germ û saz in
xwezîxwaz in
Gulbihar
Nerm û az in
Caz û laz in
Noz û naz in
Gulbihar
Hin silav in
Bi gulav in
Hin xoşav in
Gulbihar
Têr bizav in
Tîr û dav in
Pir belav in
Gulbihar
Zêr û zîv in
Têşt û şîv in
Hin paşîv in
Gulbihar
Pir evîn in
xemrevîn in
baş dipîvin
Gulbihar
Saz welat in
Deşt û lat in
Geş civat in
Gulbihar
Tirh û kat in
Xweşxelat in


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bo me hatin
Gulbihar
Dil birîn e
Pir evîn e
Xweş bixwîne
Gulbihar
Evîn jîn e
Tu b'reşîne
Can derîne
Gulbihar
Bîrbelav im
Sist û xav im
Xew li çav im
Gulbihar
Daxhinav im
Bê bizav im
Lavelav im
Gulbihar
Gêj û lal im
Wêranmal im
Her dinalim
Gulbihar
Kalelaw im
Bîrzelal im
Tim dikal im
Gulbihar
Ez ne baz im
Ne tolaz im
Hunerbaz im
Gulbihar
Belengaz im
Ne fêlbaz im

Ez gulxwaz im
Gulbihar
Hunerpîv im
Bê delîv im
Nîvenîv im
Gulbihar
Nîvenîv im
Xweşkirîv im
Baş dipîvim
Gulbihar

Ranye, sala 1964-ê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Bilbil jivanê gulê ye

Têbînî:
Babê min ev helbesta xwe di xortaniya xwe de nivîsî û wek xwendina heyranokên bedlîsî, botanî, hekarî û badînanî ji xwe re dixwend û geh bi geh bendên wê diguhurandin. Lê dema stranbêjê hunermend Mihemed Şêxo hat serdana me, ev helbest bi xwe winda bûbû. Ji lew re babê min neçar bû û beşa ko hat bîra wî dayê, da ko ji xwe re bike stran û belav bike.

1. Helbesta kevin

Ez bûme pîrê xemcivîn
Mest û bê hest û jêr nivîn
Hêşta jivanê gulê me

Evîna wê ez pîr kirim
Yekcar bê hiş û bîr kirim
Hêşta jivanê gulê me

Li dil vebûne sed birîn
Ji derdê wê gula şirîn
Hêşta jivanê gulê me

Hejar kirim, xembar kirim
Şaş û nezan û har kirim
Hêşta jivanê gulê me

Dilê xemgîn kir êş û jan
Agir berdaye dil û can
Hêşta jivanê gulê me

Sitem pir kir li min felek
Xistim dava çavên belek
Hêşta jivanê gulê me

Evînê ez varî kirim
Bê ol û çavtarî kirim
Hêşta jivanê gulê me

Hey zalimê bê bawerê
Pa kanê peymana berê
Hêşta jivanê gulê me

Nesax kirim, bê hal kirim
Enya kever bin çal kirim
Hêşta jivanê gulê me

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

2. Helbesta ko babê min da stranbêjê hunermend Mihemed Şêxoyî.

Ez bûme pîrê xemcivîn
Mest û bê hest û jêr nivîn
Li dil vebûne sed birîn
Ji derdê wê gula şirîn
Bilbil jivanê gulê ye

Evîna wê ez pîr kirim
Yekcar bê hiş û bîr kirim
Hejar kirim, xembar kirim
Şaş û nezan û har kirim
Bilbil jivanê gulê ye

Dilê xemgîn kir êş û jan
Agir berdaye dil û can
Hey zalimê bê bawerê
Pa kanê peymana berê
Bilbil jivanê gulê ye

# Ji evînê narevîn

*Kur:*
Dilberê dilrevînê
Cwanê finda şevînê
Hatim baxê evînê

*Keç:*
Tu ser çavê min hatî
Roj î li min hilatî
Xêr û bêr û xelat î

*Kur:*
Tu dilberek aqil î
Ser bextê min kakil î
Evîna te da dilî

*Keç:*
Evîna me da deng e
Pesnê evîn sedreng e
Çax borî l' me dereng e

*Kur:*
Li vê nêçîr û ravê
Ez û tu ketîn davê
Evîn derçû j' tengavê

*Keç:*
Ji evînê na revîn
Daxwaza dilê hev în
Heval were baxivîn


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

*Kur:*
Bi nîgar û bi nexş î
Tu nêrgiz û binefş î
Bo jîna min tu rewş î

*Keç:*
Ez gul im, her dem bûk im
Ber dilê te biçûk im
Were peymanê nû kim

*Kur:*
Çav û dil û destê min
Bo gula ser textê min
Spîtahiya bextê min

*Keç:*
Bes bixwîne navê min
Hey bînah'ya çavê min
Pêtê da hinavê min

*Kur:*
M' b' şîreta seyda kir
Wek bilbilê şeyda kir
Gula corî peyda kir

*Keç:*
Lawko mala te ava
Dil dixwazî ser çava'
Bi rengê bûk û zava

*Kur û keç:*
Em dixtorzanê hev in
Gewherê canê hev in
Herdu dermanê hev in

## Bawer bike

Bawer bike, ev salek e
Jîn û mirin nik min yek e
Rabe gulê biskan şe ke
Çerx ziviri hat felek e

Vê delîvê ji des' neke
Ez xulamê xwe berhev ke
Evîngehê li min ve ke
Ne bêje eger û heke

Jîn kurt e şev û rojek e
Ger piçek e, ger gelek e
E' şkestî me, m' j' bîr ve ke
Ez bêkes im m' j' bîr neke


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Ez dizanim tu çend î

(A)
Ciwan û hoşemend î
Kan'ya xoşav û qend î
Huner û hunermend î
Kes nizanê tu çend î

Ne kurt î, ne bilind î
Rewşa gund û govend î
Şox û şepal û rind î
Sorgula Hemawen î

Bê zincîr û bê qeyd î
Serbextê min tu merd î
Dermanê hemî derd î
Bûka esman û erd î

Ez dizanim tu çend î

(B)
Ne kurt î, ne bilind î
Şox û şepal û rind î
Ez dizanim tu çend î

Kan'ya xoşav û qend î
Dermanê hemî derd î
Ez dizanim tu çend î

Wêrek û eqlemend î
Zîrek û hunermend î
Ez dizanim tu çend î

Serbextê min tu merd î
Rewşa gund û govend î
Ez dizanim tu çend î


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Dil ji min bir

Vê yarkujê tîrek weşand
Hinav û dil pê herişand
Agir b' ser de lê reşand
Sed bîr û bawer hilweşand
Hawar li min
Dil bir ji min

Dilek ne ma, ko ne livand
Kesek ne ma wê necivand
Bi vîna xwe wê nenivand
Wê dil ji pîran jî revand
Hawar li min
Dil bir ji min

Perde ne ma wê nedirand
Sofî ji kuncê zivirand
Ji ser û dil îman firand
Wek Botanî ew jî xirand
Hawar li min
Dil bir ji min

Malta, sala 1961-ê

## Ya Reb te bo kê hêlaye

Şoxek îro l' mi' peyda bû
Zîna welatê kurda bû
Şox û şeng bû
Perîreng bû
Ya Reb te bo kê hêlaye?

Ken û şadî ser lêva' bû
Baxê hinar û sêva' bû
Şox û şeng bû
Perîreng bû
Ya Reb te bo kê hêlaye?

Gula hemî sorgula' bû
Dosta hemî bilbila' bû
Şox û şeng bû
Perîreng bû
Ya Reb te bo kê hêlaye?

Zuleyxa bû, Zuleyxa bû
Çenda bêjî her hêja bû
Şox û şeng bû
Perîreng bû
Ya Reb te bo kê hêlaye?

Gundê Maltayê, sala 1961-ê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Zimanê kurdî

Heta kengê, heta kengê
Nezan û dîl û xembar bîn
Me dil pir bit ji kovana'
Bêçar û bêkes û jar bîn

Bextê me wek ruyê dijmin
Heta kengê hosa' reş bit
Heta kengê, heta kengê
Tinê ev millet biheş bit

Ji bo pêşvebir'na ziman
Evro hene hezar derge
Eger bawer nekin ji min
Dişêm bînim hezar belge

Ji gazindan me dil pir bû
Birîn derbûn li ser sîn e
Eger bêjim, hene bêjin
Eve gêj e, eve dîn e

Hezar derdên giran hene
Can û cendek jev deranîn
Ji wan çendek hene dijwar
Nikarim ez bidim zanîn

Ev zimanê têr û hêja
Wek dibînim eger wa bit
Bê guman e hezar sal dî
Ji dijwarî rizgar nabit

Dewlemend e zimanê kurd
Sax û rewan û her maye
Hezar sal e bê sexbîr e
Ji bo me ev ji ber ma ye

Dixwînim ez, dibînim ez
Ristesaz û têrgiyan e
Kêmasiyek eger heye
Xwedanê wî bê îman e

Sala 1973-ê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM